Bi boneya cejinên qurban û sersalê ên pîroz
Daxuyaniya Eniya Felata Nîştimanî li Sûriyê
Ji gelê me yê dilsoz re

Ey welatiyên azad û bi rûmet, cejina we pîroz be, cejina sûriya xoşewîst pîroz be, ew her şad û serfiraz û di nav aştîtî û aramiyê de bimîne. Ey welatiyên hêja... Şev li pey şevê derbas dibe û em kûrbûna birîna ku malbata serdest di tevna me ya nîştimanî û di pêwendiyên me yên erebî û di pêgeha me ya navneteweyî de hiştiye dibînin tevî mezinbûna karesata ku wê li ser cilên zarokên me di sibeha cejinê de anjî sifreya wan û hemî pêwîstiyên wan yên cî û kar û xwendin yanjî mafên wan di peydekirina derman de ku nexweşiyê ji wan dûr bixe û rê li ber geşbûna laşên wan vebike ku bikaribin barê projeya şiyarbûna nîştimanî di çarçoveya neteweyeke bihêz û hevgirtî de, hilgirin. Ey welatiyên hêja… Ji xwe re li rewşa yekîtiya nîştimanî binerin di bin saya tunebûna wekheviya derfetan û destdanîna tiwêjeyeke keysperest ser derfetên nîştimanî di pileyên bilind û nizim de, ji wezaretan bigire ta bi karûbarên diplomasî û şandeyên xwendinê ,kirêya karkerekî li kargehê,anjî para dartaş anjî hesinkarekî ji dar û hasin anjî para cotkarekî ji tov , heta tu bigihêje rawestandina hevwelatî li ber dergehên firnan ku bi saetan dimîne da ku para zarokên xwe ya nan qezenc bike.Gelo ew kesên ku agirê kînê û zikreşiyê di navbera hevwelatiyan de gur dikin dixwazin ku para nan jî ji wan bistînin?Gelo ew diramin ku hindek dever ji parêzgeh û bajar û bajarok û gundan biguherin bo pileya diwem ji ber hindek sedemên ku pêtiviyên siyaset û parastina yekîtiya nîştimanî rê nadin ku em wan eşkere bikin:bajar in bi komên çopê weke sizakirina xelkên wan ji ber nêrînên wan yên siyasî û dîroka wan a nîştimanî!

Gelo ew kes bandora yasayên bêparkirina sedan hezar ji birayên me yên Kurd, hevpişkên me di xweşî û nexweşiyê de, di dîrok û dema niha û welat û baweriyê de...ji girêdan û mafan, tevî lêpirsîn û destgirtina çalakvanên wan ta bi bêparkirina wan ji mafê bijartina awazeke kurdiya dilşewat li ser telefonên destan..?!

Gelo ew bi şopên zagona 49/1980, anjî bi encamên mayina dehan hezar welatiyan di lîsteyên windabûyan de di sibeha cejinê de ramiyane?Gelo ew ramiyane bi hijmara bav û dayik û jin û zarok, bira û xuşkên ku li benda nûçeyekê ne derbarê kes û karên wan yên dûr û windayî?Gelo wan tevgera biguman ya balyozê îranî û alîgirên ku bi navê wî û hikûmeta wî di bajar û gundan de belav bûne di çarçoveya bizaveke propagandeya erzan di dema

ku navçe bi agirê fitneya mezhebî a tirsnak ku gefan li iraqê dixwe û aramî û yekîtiya lubnanê dixe metirsiyanê de, çavdêr kirine?! Ey welatiyên birêz… Gelo ji aliyê xwe de, hun ramiyane li dor sedemên qeyranên aborî yên tund û rewşa belengazî û bêparî û bêkariyê?Gelo hun bi samanên mezin yên ku malbata serdest ew dane hev di riya gendeliya xwe de ji mewdana gel û dahatiyên welat ramiyane?Gelo hun ramiyane çawa dêwê gendeliya malbata serdest serî hildaye û welat berev xizanî û lawazbûnê ve biriye? endamên malbata serdest dema ku deselatdarî bi dest xistin ji bilî mûçeyên wan tiştekî wan nîn bû, lê bi gendeliya xwe samanên herî mezin di bin saya tepeserî û despotismê de kom kirin. Ey welatiyên birûmet… Serokê rêjîmê sloganên berxwedan û desthilanîn û dijayetîkirinê bilind dike di heman dema ku ew bi zikxişkê berev diyalogê bi israiliyan re diçe li ser hisabê colanê bi akama ku heye ew alîkariya wî bikin di ewlekariya rêjîma wî de û bidawîanîna cudakirina wê a navneteweyî.Diyar e ku ti girêdan di navbera serokê rêjîma despotîk û gendel û gel û welat de tune ye, serokê rêjîma despotîk û gendel tawanên kuştinê li lubnanê bi mebesta veşartina dosiyeyên gendeliya xwe û malbat û darûdestên xwe û berdewamkirina serdestiya xwe li ser lubnana cînar, bikartîne .gelo hun ramiyane çima wî hizbullah û tevgera emel û hevbendên xwe yên li lubnanê berev vekirina cengeke hundirîn ajotin ku lubnan xiste rewşa nakokiyê eger ku biteqe dê cengeke sivîl pêk were û lubnanê wêran bike û kartêkirina xwe li ser sûriyê û navçeyê jî bihêle Gelo ne ji ber qedexekirina danîna dadgeheke navneteweyî ye?Gelo ew wisa dirame ku dê ji pencê dad û zagonê rizgar bibe? Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê(EFNS)aliyên lubnanî vedixwîne bo parastina yekîtiya wan ya niştimanî û ew nebin alav ji bo herifandina wê, her weha ew hizbullah vedixwîne bo ku ew dîroka xwe a xebatane di kolanên bêrûtê de winda neke Ey welatiyên birûmet… Gelo hun bi sedemên xistina sûriyê di refa berjewendiyên iranî de û dûrxistina wê ji neteweya wê ramiyane? Gelo hun ramiyane sedemên alîkariya di navbera alavên istixbaratên sûrî û yên îranî di iraqê de bi akama gurkirina nakokiya mezhebî a xwîndar weke rê vekirina li ber serdestkirina îranê li ser iraqê?Û rola wê di filistînê de di warê cudakirina yekîtiya niştimanî û zêdekirina azara milletê filistînî angu girêdana xelekên stratîciya îranî yên ku ji deryaya sipî a navend destpê dikin ta bigihêje asiyaya navîn? Gelo hun ramiyane bi radeya bive û metirsiyanê derbarê ewlekarî û berjewendî û paşeroja sûriyê û dewletên erebî yên din? ev rêjîm welat berev xirabûnê ve dibe û bûye biveyeke mezin derbarê ewlekarî û paşeroja sûriyê û navçeyê bi giştî. Ey welatiyên birêz… Di bin saya van cejînê pîroz de …ji mafê me û yê we ye ku em bipirsin gelo ev nakokî dê yekîtiya me ya niştimanî bikudê ve bibin? Gelo ew dê tevna me ya civakî û siyasî bigihîne ku? ev siyasetên ku rehendê me yê erebî û cînarên me yên ereb û biratiya erebî kêm dikin dê me bigihînin ku ?Gelo heta çi radeyê mafê Esedê"piçûk" heye ku ew kesên ku di temenê bavê wî de ne û bi salan ew hembêz kirine û bi salan bihna xwe jê re fireh kirine weke "nîv-zilaman" bi nav bike…û saxlemiya hişê wî ji xwe dev ji pirsên danûsitendin û atîkêta giştî berde ku herdem li ser piçûkan rêzgirtina mezinan ferz dikin?!!! Li ser asta navneteweyî, siyasetên serokekî ku baweriya xwe windakiriye û di nêrîna gelekan de mîna(şivanê derewçîn) tê naskirin dê me bikuve bibin?li vir em ne rastî anjî çewtiya nêrîn û konevaniyan guftûgo dikin, lê

em nêrîna giştî ya ku vî serokî li pêşiya cîhanê tevî daye xwe,û herî bêtir ji hundirê welêt re, dema ku wî hertiştê ku di gotara sondxwarin û di hevdîtin û hevpeyivînên xwe de gotî bicih ne anî? Û di çarçoveya navneteweyî de ji piraniya serokên cîhanê re hatiye xuyakirin weke bêbawer û derewkar û fêlbaz, heta radeya ku ew ji lîderên israilê re bi serçimîneke nedîtî bibêje werin(me ezmûn bikin...). Ey welatiyên birêz... Serkirdayetiya siyasî ne karê serkêş û bazirganan e, û çarenûsa millet û welatan ne lîstik e ku keysperest pê bilîzin û azadiya welatiyan û rûmet û zad û pêwîstiyên wan yên sereke û pêtiviyên wan yên bingehînî û xweşhaliya wan ya aborî û civakî bi minnet binirxînin, ev hemî ne minneta serokekî anjî lîderekî ne; ew hindek ji mafên welatiyan yên bingehînî ne yên ku ji encama girêdana wan bi welatekî xoşewîst û birûmet mîna Sûriyê ve têne holê. Ey welatiyên birêz… Herçendî rê li ber we werine girtin,zarokên we tûşî desttengiyê bên , hindek mafên we yên aborî û sivîl û mirovî weke minnet bêne jimartin, pilan li welatê we werine girêdan, û destên xêrnexwazan welatê we kavil bike, bizanibin ku sedemê pêşîn û dawîn malbata serdest û rêjîma gendel e ya ku rêbaza tepeserî û gendelî û durûtiyê dişopîne…..heta kengê mafên me bên xwarin û em bêdeng bimînin!welatê xwe rizgar bikin, mafên xwe biparêzin, pariya zarokên xwe misoger bikin û derfetên wan di paşerojeke azad û birûmet de dabîn bikin… Ey parêzvanên welêt de rabin! Cejna we a qurbanê pîroz be!

Sersala we pîroz be!

Eniya Felata Niştimanî li Sûriyê
27 çileya pêşîn 2006